Hîn gelek kêmasiyên me hene û em kurd hîn negihîştine asta welatên pêşketî, lê em li gor welatê cîranan pir pêşde ne. Divê em kurd vegerin ser koka xwe, ser çand û dîroka xwe ya resen, da ku pirsa jinan, bi rê û rêbazên mirovî din hevûdu.

Sûd û mifayên hejîrê

Faydên hejîrê:

1- Kolestrol dadixe. 2- Rûvikan dixebitîne. 3- Ji bo qebizbûnê baş e. 4-Bedenê ji madeyên toksît paqij dike. 5- Çavkanî enerjîyê ye. 6- Hestîyan bihêz dike. 7- Rîskên krîzên dil kêm dike. 8- Ji bo buhurandina êşên qirikê baş e. 9- Di bedenê de çêbûn û nûbûna şanê lezûbez dike. 10-Belxemê tavêje. 11- Ji bo qûtê rojane dibe arîkar. 12 – Beden bihêz dike. 13- Ji bo bronşît û kuxukê baş e. 14- Ji bo tayê û zekemê baş e.

Bikaranîn:

1- Çiqek hejîrê bibirin, wê şîrek jê derkeve, ku hûn wî şîrî deynin ser kul û cihên qusiyayî hûnê pê rehet bibin.
2- Hejîrê bikin nav cezweya qehweyê, şîr berdin ser, bikelînin û hêdî hêdî vexwin. Hûnê ji xirabûna (ketina) deng, kuxuk û qirikêşê bifilitin.
3- Hejîrê li şîr, sîrke, an jî dohnê zeytê têwerkin û bixwin. Hûnê ji bawasîrê rizgarbin, ku hûn hejîrê biqutin (biherişînin) û deynin ser qûnêrê, ewê qûnêrê der keve.
4- Heke hûn hejîrê bi kakilên gûzan ve bixwin, wê bedena we ji jehran biparêze. Ji bo kuxuk û şewbê jî baş e.

Birîneke di Gewriyê de

Ronî ELÎ

Çi bû ev ..
Birûska di sînga jinebiyan de bû
An
Şelpeyê seybê
Li cerga caniya tîmar nekirî bû ..!
Bi niçniça keskesora
Di memikên aso yê de
Bersiva Şivanê helbestan
Di rewrewa Segan re
Deng vedida
Û digot :
Min .....
Deriyê koza Xalxalokên evînê
Sparte dergevanê Şevê
Berî ku
Topa Berbangê
Xelata kujeriyê
Ji Qîlên seydayê Ejdeha
Werbigrê
Çibû ev ..
Talîzoka Bayekî dîn bû
An
Dînekî
Di argûnê nanpêjekê de
Çivîkên berê Biharê
Hilqetandibûn
Û di gewriya Yareke dilkoçer de
Siloganên Şeyd û dilketinê
Vemirandibûn
Di dema ku
Fermana pûştiyê
Dinav teşk û giyanê
Welatekî nifir lêketî de
Di destên tolazên kolanan
Û sextebazên di hembêza canfiroşan de
Bi Şûrê Elah û Ekber
Hatibû lidarxistin
Û bi kar xistin
Çibû ev ..
Xençera di nameya Çavên kenok de bû
An …
Geşteya karwanê di devê deryan de
Ku ji bihna welatkî beravêtî
Kulmek ax
Bi giyanê mirinê re
Kiribû hevbeş û heval
Da di şewata bîranînan de
Rondikên hêviyan ziwabike
Û bi lorîna hey welato re
Hevîrê penaberiyê
Ji Axa şewitî
Bide ber lêvên kuzirî
Û landika paşerojeke bê deng
Di kolanên tî de
Li ser milên xûz
Bi halan û lîlanan
Bihejîne … Bihejîne û …….. Bihejîne

Çîroka Hecî Rovî

Hebû tune bû, roviyekî pir fenek hebû, roj bû şev, derdor tarî bû, rovî rabû ji bo xwe piçekî geriya, çû binê gund, ber malakê de bihurî, jinka wê malê, mast çêkirîbû. Rovî hat serê xwe kir di nava dîska heşê de. Serê rovî heta milê wî bû bi mast. Serê xwe derxist çû li ber neynikê, ku serê xwe dît.

Rovî got: -Wîîî... Ez bû me hecî, welle çare nîn e ezê herim hecê.
Roviyê fenek da rê, çû çû çû... Paşê kewek rast rovî hat.
Kewê got: -Hecî tu bi ku de diçî?
Rovî got: -Ezê herim hecê.
Kewê got: -Hecî, tu min jî bi xwe re nabî?
-Belê, hevala Kewok, jixwe ez jî ji xwe re hevalake wekî te digerim.
Kew û rovî bûn heval, dane rê çûn. Hindekî din jî çûn, hatin ber malakê, temaşe kirin, dîkek çûye ser banê mala xwediyê xwe bang dide. Paşê dîk mêze dike ku, ji dûr ve, kewek û roviyek tên. Deme ku ew nêzik bûn, dîk ji wan pirsî: -Waaaa Hecî Rovî, hûnê bi ku de herin?
-Emê biçin hecê
-Wîîî... ev gelek baş e, hûn min jî bi xwe re nabin?
Rovî got: -Belê, hevalê dîk, jixwe em jî xwe re hevalekî, wekî te digerin.
Wî jî da gel wan, dane rê çûn. Hinek din jî çun, vê carê, kutkutokek hate pêşiya wan.
Kutkutokê got: -Hevalno hûnê bi ku de herin?
-Emê biçin hecê
kutkutokê go, ez dixwazim ez jî bi we re bêm.
Rovî got: -Tu jî were havalê kutkutok
Her çaran bi hevre , dane rê çûn,çûn,çûn...
Roviyê hîlekar got: -Hevalno! Em diçin hecê lê belê hinek şert û mercên min, hinek jî sûnnet û ferzê hecê hene. Ezê niha biçim, li ser vê zinara han a bilind û mezin rûnim, ezê car caran kevirekî biavêjime jêr, dema ku min ber avête jêr, yekî ji we, bila bê cem min.
Roviyê fenek ev xeber got û çû li ser zinara mezin û bilind rûnişt. Bi çend deqqe paş de, rovî kevirek avête jêr.
Kewê got: -Hevalno cara yêkem ezê biçim li cem rovî.
Got û çû li bal hecî rovî rûnişt.
Rovî gote kewokê -Erê hevala kewok, tu sibe heta êvarî serê daran wan serê wan kevir û nawalan di sekine heta êvarê dike qî qebu, qî qebu, qî qebu... dibêjin tu qebankî dixwazî, qayî kes nikare te bi kuje.
Kewê got: -Hecî, ew jî xeberdana me ye, îbadeta me ye, em jî wisa gazî xwedê dikin.
Hecî rovî devê xwe avête qirika kewê û dixwe. Paşê kevirekî din jî diavêje jêr. Vê carê dîk diçe cem hecî, rovî dibêje: -Dîko tu diçî xwe diavê ser mirîşkan, paşê jî diçî, cenabet cenabet bang didî, qey ev tişt di olê de rast e, heqê te kuştin e.
Rovî wiha dibêje û qirka dîkê reben diqire û dik jî dixwe. Paşê kevirekî din jî davêje jêr. Vê carê jî teyra kutkutok tê cem hecî. Hêj hecî devê xwe venekir, kurkutokê axift û got: - Ez zanim, hecî tê min bixwî, lê belê ezê pêşniyarekê bidim te. Min nexwe, çûnkî ezê çim du hevalê xwe yên qelew bînim bo te, tu wan bixwe. Baş e hecî.
Hecî fikirî û got: - Temam, here bilez, wan hevalên xwe ji min re bîne. Teyrê kutkutok çû gudekê, temaşe kir, niçîrvanek li gund de derket pê wî de 4 - 5 tajî jî pêre ne. Kutkutok dada pêşiya van tajîyan, hindî tajî nêzikî kutkutokê bû, kutkutokê xwe dûr dikir. Heta kutkutokê tajî giheştan li nêzikî hecî rovî, paşê kutkutok got:
- Hecî min ji te re, hevalên xwe anîn, cavê hecî manvekirî, û di dilê xwe de got, havalê kutkutokê, kutkutoke ber wê çendê kutkutok dê hewa ve bên. Tajî gihaştin li bal hecî, temaşe kirin, kutkutok li pişt rovî sekinînin, cavê rovî çûn pişt sere wî. Hecî çi dît çar tajî xwe li bin guhê wî dan. Tajiyan hecî rovî bijikand û kuşt. Kutkutokê tola havalên xwe, kewok û dîk ji rovî vekir...

Vegotin: Mele Ehmedê Kumêrî.. Guhdar û nivîs: Bedredînê Wanî

Metel - Gotinên bav û pîra

Aqil taca zêrîn e di serê her kesî de nîne	Bilind nenêre nizim nekeve
Agir bi agir nayê vemirandin	Bira bira ye bazar xuya ye
Ava hêdî, min ecêb jê dî	Bîra ti avê jê vexwe kevra navêjê
Aqilê sivik barê giran e	Bipirs ji kalê zemana û ji xortê geryayî
Agir bi dehlê keve, hişk û ter tevde dişewitine	Bela mero ji ber nigê merov tê
Av di gola de genî dibe	Bipirsê mirov dighê xursê
Av û ar tucar nabin yar	Bîr bi derziyê nayê kolan
Ava xwestî naçe hastî	Bila hindik be bila rindik be
Başkiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro	Ecelê biznê tê ,nanê şivên dixwe
Bawerî hêza jiyanê ye	Ê ne ji malkê nizani bi hewalkê
Bedewî nayê veşartin	Ez bê ez tu bê ez wê kî here ber pez
Benîştê dêhna ji ritlê ye	Ez mîr û tu mîr wê kî bibe wezîr

Çivîkê qefilî

Ezîz Xemcivîn

Bêguman e, ev navûnîşan hinekî balkêş e.
Lê matmayî nemînin Çivîkê qefilî ez im!
Dema ez zarok bûn zivistanê li ber sermayê, ez dibûm wek Çivîkekî qefilî tevger nema ji min çê dibû. Ji ber wilo jî zarokan ev nav li min dikir. Helbet piçûkaniya xwe min ne wek zarokên niha jiyana xwe dikin min buhirandiye, ji lew ra dibêjim ko gava merov piçûk be û piçûkaniyê baş nebuhirîne, her tiştek li bala wî bê tekûzbûn* dimîne.
Ew çî ye? Helbetê qonaxa piçûkaniyê ye.. Anko eger piçûkaniyê merov bixwaze ko piskilêtekî bikire û bavê wî nikaribe ji wî re bikire, kula siwarbûna ewî piskilêtî li gel wî dimîne..
Piçûkanî ez tirsonek bûm û min nikarî bû bi cegerdarî li nav zarokên taxê bi xweşkayî bilîzim. Sedemên evê yekê jî ew e ko ez di bin tirsa Bav û delalîkirina Dê de hatim xwedî kirin. Ji tirsa ko Bavê min li min bixe, min nikarîbû ewê biryara serbest bigirim, livandina min ne xurt bû, lê zimanê min vekirî bû, û herdem min têkilî gengeşe û civata mezinan dikir..
Baş bû ko bandora delalîkirina Dê gelekî li min tune bû, çimkî gava Dê pişta law bigire û Bav sert be, tirazûya* perwerdeya zarokan dişike.

Ez li ber sermê pir qels bûm lê min mirina xwe carekê li ber germê dît; ewê hingê temenê min deh salî bû; ez bi apê xwe re çûbûm gundê wan, havîneke germ bi Kurdiya rengîn serê Guriyan li ber diheliya..
Min jî jiyana gundîtiyê ewê hingê ne dîtibû, pir caran ji tirsa Kûçikan re eger zarok bi min re tunebana min nikarîbûn deh gavan dûrî xaniyan biketama… Sibehê zû apê min î piçûk xwe kar kir ko here ber pez; min jê xwest ko ez jî li gel wî biçim, ewî jî dilê min nehişt, li gel xwe ez birim..
Em hêdî hêdî li pêşiya pez dimeşiyan wilo me ew diçêrand.. Her em tî(tihnî) dibûn, me ji meşka (metere) ko bi bin zikê Kerê ve girêdayî bû, me av vedixwar.. Nîvrokî, apê min dît ko av nemaye, û ez jî pir tî bibûm, apê min matmayî ma; av li wê çolê qet tune û em jî dûrî gund in; rabû got ez ê Pez nêzîk bikim ser sînor ta ko gund ji me ve xuyanî bike, û ez ê li te binêrim heta ko tu bigihê nêzkî gund..

Ez jî tev ko ji Kûçikan ditirsiyam; lê ez “mecbûr” bûm ko biçim, çimkî gelekî tî bibûm.
Apê min ez gihandim ser sînorê gund heta gund xuyanî bû, lê her ji min re di ewî temenî de vegera gund zor bû; lê divê ez vegerim!
Ez hatim û hatim lê gund nayê û li ber min nêzîk nabe û tîbûn zorê dide min, geh ketim, geh rabûm dawî ji ser hişê xwe ve çûm û nema şiyar bûm..
Li gund kurê apê min li nav zarokan dilîst, ji dûr de dibîne ko yek (kesek) bi aliyê gund ve tê lê piştî kêlîkekê nema dibîne, dibehite gelo ev kî ye û çima evê germê xwe davêje erdê û ranabe?!!.. Bi lez diçe bal meta min; jê re dibêje, ew jî dizane ko ez bi apê xwe re çûme ber Pez, û nêzîkbûna Pez di nîvro de nenormal e; hema ji cih ber bi sînor de baz didin û bi min ve tên. Ez jî gelekî dûr bûm lê ne li hişê xwe bûm.. Meta min hat ez li pişta xwe kirim, bi rê ve min çavê xwe li ser bang û qîrîna wan vekir, tenê min gotinek got (metê ez tî me) û dîsa ji ser hişê xwe çûm…Nîvmirî ez gihandim gund, ji jîrbûna meta min serê min daqûlkî şûşt û tenê gulpek av da min û bi baweşînkê ba li min kir, her min digot ka avê ewê gulpek tenê dida min, tako ez bi hiş xwe ve hatim û gulpa jiyanê ji nû ve da min, min ji destê ciwanikê girt û bi xêra wê vexwar

Qado Şêrîn:PYDê nikare bi tena xwe Kurdistana Sûriyê biparêze

Sîpan Xelîl

Rojnameya Ciwan derbarê rewşa Kurdistana Sûriyê û rûdanên ku vê dawiyê li bajarê Kobanî qewimîn hevpeyvînek ligel nivîskarê Kurd Qado Şêrîn ku niha li Hollanda dimnîne pêk anî.

Rojnameya Ciwan: Rewşa Kurdistana Sûriyê çawa dinerxînî?

Qado Şêrîn: Ji bo bersivdayîna evê pirsê, û jer ku rewşa me ya giştî girêdayî partiyên siyasî ye, eger mirov li rewşa partiyên Kurd ên siyasî binere, wê mirov rewşa Kurdistana Rojava baş fam bike. Çar sal in partiyên me bi çareserkirina pirsgirêkên navxweyî ve mijûl in û çareser nebûne, û xuyaye wê çareser jî nebin, çimkî wek hev nafikirin, hevdu qebûl nakin û li hev guhdarî jî nakin. Mixabin her partiyek texmîn dike ku ew rast e û yên din şaş in û divê wek wan bê kirin, êdî nakokî û pirsgirêk bêtir dibin û berdewam dikin.
Ji ber evan nakokî û pirsgirêkên navxweyî, hin ên di nav ENKSê de û hin jî di nav ENKSê û Tev-Demê de û ne yekkirina helwest û gotara Kurdan bûne egera bêhîvîbûna xelkê, windabûna riya baş û rast boyî bidestxistina mafan û ji dest berdana derfeta zêrîn a ku belkû sed salên din dubare nebe.
Di encama wan nakokî û pirsgirêkan de, û ji ber serhişkiya PYDê û asayişên wê, êdî Kurd xaka xwe dihêlin û koçber û penaber dibin. Nimûne; leşkeriya neçarî û standina bacan.

Komkujiya kobanî te çawa dît?

Li pêşî rastexo yan jî xwarexo desthilata PYDê wek desthilat tawanbar dikim, çimkî parastina xelkê zortir û pêwistire ji rizgarkirinê.
Bi texmîna min terorîstên DAIŞê ji Kobaniya qaşo rizgarkirî qet derneketibûn, ta ku carek din di şeva xedrê de êrîş bikin, êdî wexta şervanên YPGê bajar li paş xwe hiştin û çûn Girê Spî û Til Îsa rizgar bikin, terorîstên DAIŞê derfet dîtin ku êrîşî xelkên sivîl bikin.
Eger xiyanet li Kobanî nebûba, wê ewqase xelk nehatina kuştin, çimkî êrîşkeran cilên YPGê li xwe kiribûn û bi Kurdî û bi şêweyên YPGê bi xelkê re diaxivîn.
Dr. Ebdilcebar Şahîn ku ji xelkê Kobanî ye, di postek xwe de Heval Hemze(Êrîş) tawanbar dike. Heval Hemze serbazekî YPGê bû, bi biryara wî li xwepêşandanên aştiyane gule hatin barandin û di encamê de ciwanê bi navê Welat Hisî hate kuştin. Her wiha tê tawanbarkirin ku bi alîkariya wî DAIŞên di zindanên “Kantona Kobanî” de hatine berdan, êdî PYDê mecbûr ma wî biqewitîne. Ji wê wextê de winda bû, êdî tê texmîn kirin ku wî di şeva xedrê de êrîşî sivîlan kiribe.

Nirxandina te ji şerê Hesekê re?

Lîskeke eşkere ye di navbera her sê hêzên sereke de, rêjîm, DAIŞ û PYDê de. Çimkî me dît bê çilo hêzên niştimanî yên bi ser rêjîmê ve tev li YPGê dibin, her wiha hate ragihandin ku rêkeftinek di navbeyna rêjîm û YPGê de çê bûye. Ji xwe ji bo ku herêm ji Kurdan vala bibe û demografiya wê bê guhertin, li pêşî DAIŞê êrîş dike û di dûv re firokeyên rêjîmê lê didin.
Bi texmîna me, rêjîmê xwest ji dûv şerê Hesekê du

nameyan ragihîne, ku ew kêmneteweyan diparêze û ji ber wê firoke bi kar anîn û rêkeftin bi YPGê re kir, û ya din ji cîhanê re diyar bike ku şerekî giran li dijî terorê dike.

Tu hêviyan li ser ENKSê piştî kongreya wê datîne?

ENKSê laşekî nexweş e, êdî derman jî nema dikarin wî laşî saxlem bikin. Ji sala 1957an ve ku yekemîn partî hatibû damezirandin pirsgirêk û nakokiyên navxweyî û perçebûn berdewam in, ji xwe di çar salên dawî de jî perçebûn û nakokî berdewam bûn û ENKSê nikarîbû xwe biparêze, her wiha nikarînû bibe hêzeke siyasî û nûnertiya gelê kurd bike. Helwest û gotara ENKSê ne azad bû, ne jî serbixwe bû û ne jî di asta hêviyên xelkê de bû, çimkî nikarîbû xwe li ser Tev-Demê ya wek desthilat û rêjîma nû ferz bike, û nikarîbû Tev-Demê mecbûrî qebûlkirinê bike. Ji ber van egeran û eger in din êdî hêvî li ser nayên avakirin. Piştî kongir partiya Pêşverû vekişiya, xortan gazin kirin, biryar nehatin standin, û gelek nimûneyên din.

Behsa derbasbûna Pêşmerge tê kirin, tu çawa vê yekê dibînî?

Eger Pêşmergeyên Rojava ne bi biryarek navnetewî derbas bibin, wê şaşiyek mezin be, çimkî bi texmîna me wê tûşî gelek şikestin û xedrê bên, wê gelek pirsgirêk bên pêşiya wan, wê PYDê a ku ji xwe pêve tu hêza din a Kurdî qebûl nake, wê gelek pirsgirêkan ji wan re derxîne. Ji xwe ENKSê nikare mirîşkekê xwedî bike û nikare kîsek nan di bin sîwana desthilata PYDê de peyda bike, êdî wê çilo nan û av û çekan ji wan re peyda bike. Her wiha ENKS nizane siyasetê, vêga wê çilo leşkeriyê bike.
Bi texmîna me ku bi biryarek navnetewî derbasbûn jî, wê Amerîka gelek şert û mercan li ser wan deyne, nimûne; wê nehêle şerê rêjîmê bikin.

Eger PYDê nehişt tu ji bo vê yekê çi dibêjî? Eger Kurdayetî be wê bihêle, lê bi texmîna me ta ku rêjîm neçe, wê PYDê nehêle Pêşmerge derbas bibin, ji ber rêjîm naxwaze, naxwe çima Sotoro û hêzên Mihemed Faris qebûl dike?

Ma Rojavayê Kurdistanê samanê dê û bavê PYDê ye, ma bi morîkên diya xwe kiriye? di dûv re ji rêjîmê pêve kesekî maf nedaye PYDê ku bibe desthilat li Rojavayê Kurdistanê, êdî ne ji mafê wê ye wê biryarê bistîne, lê biryara wê ne serbixwe û azad e, hin rêjîm û hin Qendîl û Îran di biryara wê de beşdar û bi bandor in.

PYDê bi tena xwe dikare parastina deverên Kurdî bike?

Helbet nikare, komkujiya Kobanî baştirîn nimûne ye.

Wekû rewşenbîr çi di vê demê de ji we tê xwestin?

Mixabin partiyên me fêr nebûne li rewşenbîran guhdarî bikin, û ji ber wê ewqase nakokî û pirsgirêkên navxweyî derdikevin. Eger guhdarî bikirna, helbet wê rewşa me baştir ba. Li tevaya cîhanê rewşenbîr wek şêwirmendên siyasetvanan in û şîret û pêşniyarên baş li ber wan datînin. Ji bo standina biryarên baş şêwra rewşenbîran tê kirin, her wiha ji bo helwest û gotara baş jî.Li ba me rewşenbîr bûne du beş, beşê serbixwe ku ne xwediyên biryaran e, gelek caran li wan nayê guhdarî kirin, belkû ji qestî tên piştguhkirin, û rewşenbîrên partiyan yên bê bandor, tenê ji bo erêkirina biryarên partiyê tên bikaranîn û kêfxweşkirina serok in, kesayetiya xwe wek rewşenbîr winda kirine, wek welatparêz dibin endamên partiyan û erkê xwe yên rewşenbîrane pêknaynin, belkû ne ji mafê wan e.Bi giştî erkê rewşenbîr ew e ku rêyên baş, pêşniyarên baş, gotara baş, yekgirtina baş li pêş xelkê deyne, û çanda hezkirin û hevdu qebûlkirin û li hevdu guhdarî kirinê di nav xelkê de biçîne, her wiha berjewendiyên giştî di helwest û gotarên xwe de biparêze, wek parastina hestê neteweyî û ziman û xak, û xelkê ber bi azadî û demuqratiyê ve bibe.

Hêvî

Besam Mistefa

Hîn di zaroktiyê de, tê bîra min, gava em derdiketin paşmalên gund nêzîkî sînor, wextê ku xanî li me teng dibûn û ne sînorek tenê lê hezar sînor li pêş me avadibûn; em derdiketin ji bo em çixaran bi dizî vexwin (em tev çixarekêş bûnû ku xîna me mîna ya pîran bû...) û çîrokên rojê ji hevdu re bêjin û behsa nûçeyên keçikên gund bikin û hinekî bijîn di nav vê deryaya mezin ya mirinê de, bi dizî bijîn wek çixarên ku bi dizî di navlêvên me yên ziwa de wek hinek stêrk diçirisîn û dimirin û ji kulmek dumana şewitî pêve tu tişt yan bîranîn li paş xwe nedihiştin! Em zarokên Bakurekî bêzarok bûn!
Di wê çaxa dûr de wek stêrkên havîna welêt, tê bîra min, ez û hevalên xwe me çavê xwe li mirina rojane digirt, û li ser paşerojeke ronîkirî, paqij û dagirtî..paşerojeke bi xewnan hûnandî û bi hêviyan xemilandî, vedikir!
Di wê çaxê de, me pirs ji hevdu dikirin. Me dixwest em daxwaz û hêviyên hev nas bikin. Me dixwest em xwenas bikin; Em kî ne û çi ne? Ji ber ku tu kesî tu tişt ji me re negotibû, wisa her tişt ligel me nû dixuya, em herdem matmayî bûn û bi çavên zoq vekirî li jiyanê û lîstikên wê, dinihêrî! Bakur careke tenê be jî, li me ne nihêrtiye!
Jibîra min naçe dema hevalê min, wê şeva dîn, ji min pirs kir:
- Hêviya te çi ye dema tu mezin bibî!?
Wê şevê me xwe ji bîr kiribû û em nêzîkî têlên sînor bûbûn. Sînor, di pêşiya sedsala bihûrî de, wek şûrekî dirêj di sînga welat de hatibû çikandin. Ne tenê zemîn xapandibû û dever ji deverê vediqetand, lê mêjûjî serobin kiribû û xwîn ji damaran derxistibû!
Mîna marekî reşî jehrdar bû ku jehra wî wek lehiyekê li wan deveran belav bûbû: Xwedê ji wan deveran bar kiribû! Em, zarok û xortên gund, pir jê

ditirsiyan; têlên kehrebekirî, bombe, leşker û zikreşiya wan a ku pesinê xwe pêdidan, çekên wan û kina ku ji dilên wan difûriya. Me xwe pir nêzîkî sînor nedikir, lê wê şevê bi germahiya peyvê re û dilspîbûna zaroktiyê re, me xwe jibîr kiribû – jiyanê jî ji xwe em jibîr kirine!!
Vêca gava hevalê min ev pirs ji min kir hema hema min berê xwe da sînor û li wî çiyayê li paş têlan raketî mêzand û bi dilekî xweş ê zarokan, min got:
- Hêviya min di vê jiyanê de ew e ku ez herim paş vî çiyayî û bibînim bê ka çi li piştê wî heye, herim ser serê wî û çavên xwe têr bikim ji dîtina tiştên ku li paş xwe veşartine..Hêviya min tenê ez bizanibim çi li piştê vî çiyayî heye.. Em li ser kevirekî ku bûbû tuxib di navbera erdê gundiyan de, rûniştîbûn, û çixarên me jî, mîna dilên me yên biçûk, di nav lêvan de dişewitîn û wek agirê dojehê sor dibûn..jihingêve, dojeh bi ser riya dilên me vebûbû. Ez hîn bi çiya diramiyam.. (sibehan, nîvroyan, êvaran...her gav û her dem çavê vî çiyayê raketî vekirîbûn û jiber çavên min nediçûn alî!....ti mal, li piştê mala me tune bû. Ez û sînor, û çiyayê li paş sînor, çavên me di çavên hev de bûn: Em her sê jî korbûn!! Ne min dikaribû ji ciyê xwe bilivim û ne çiya dikaribû. Na, ezê bi rastî bibêjim: Min gelek caran xwest ku ez bigihêmê û wî jî gelek caran xwest lê..di navbera xewna min û ya çiya de, rastiya sînorekî hebû!
Hêj ez wiha çavgirtî û hevalê min bêdeng, jinişkave, ji aliyê sînor ve, dengê teqandina gulleyan hat û pê re pê re li nik lingên me herduyan, çend gulleyan zikê erdê qelaşt û di wir de, bi cîbûn!
Dinya şev bû. Stêrk windayî bûn û heyvê xwe dabû alî. Tirsa di dilan de raketî, bi dengê wan re şiyarbû. Tirseke kor girte ser me û cîhan li ber çavên me kir mij û moran. Gulle pir ji me ve nêzîkbûn; cara yekem bû ku mirin wiha ji me nêzîk bû. Me wê rojê mirin nas dikir, ku ji herdu çavan nêzîktir e!
Weke yekî vecinqandî li me hatibû, weke ku henekeke giran û nexweş li me hatibe kirin. Em ji wir rabûn û me dest bi bazdanê kir, ta ku em gihştin gund jî, me li paş xwe mêze nekir.
Leşkerên tirsok û bêwijdan yên ku nobedariya sînor dikirin di dûrbînên xwe yên şevînî de, çixarên me dîtibûn. Bêdudilî, gulle bera me dabûn, mîna ku em du teba bin –wan dê wisa bigota eger tu kesî ji wan lêpirsîn bikira! Lê wan wek nave xwe zanibûn ku tu pirs ji wan nayêkirin! Dema berî niha keçeken û ciwan kuştibûn kesekî nikaribû tiştekî ji wan bike: Li vir dijimin û li wir dijmin, li herderî dijmin!! Lê çawa be jî em ji wan filitîn vê carê.....
Hîn jî hêviya min pêk nehatiye. Îro hîn wek berî bîst sala ye. Çixare hîn sor dike. Xewn û hêvî hîn şiyar in. Gulleyên wan jî hîn amade ne ji bo kuştina xewnên me. Lampên sînor yên têlkirî yên rêzkirî her şev mîna ku bi destên qederekê bin, pêdikevin. ....Û çiya!
Çiyayê ku gul û binefş û asik û çav belek veşartine, çiyayê ku, li paş xwe, roj û jiyaneke xweş hilandine, hîn li ciyê xwe ye, bendewar e ew bo bicih anîna
sozê...xewnê...hêviyê, bendewar e bêdeng, raketî...lê nemir!

Destpêka rojnamegeriya kurdî di nav kurdên Rojava de

Konê Reş

Wek ku diyar e her miletek di cîhanê de, pênasîn û hebûna xwe bi zimanê xwe dide naskirin; li Erebistanê zimanê erebî nîşana hebûna miletê ereb e, li Tirkistanê zimanê tirkî nişana hebûna miletê tirk e, wiha jî li Kurdistanê zimanê kurdî nîşana hebûna miletê kurd e. Di nav gelên cîhanê de, zimanê kurdî pênasiya gelê kurd e. Di civata Netewên Yekbûyî de jî, her netewek bi ala xwe ya rengîn tê naskirin, wiha jî netewa kurd bi zimanê xwe yê kurdî û ala xwe ya rengîn di nav koma netewan de tê naskirin, angu zimanê kurdî nasnameya netewê kurd e û hebûna gelê kurd di hebûna zimanê kurdî de ye.
Derbarê me kurdên Rojava, eger xebat û bizava rêxistinên me yên Rojava di ber mafê rewa yê gelê kurd de be, bêguman ji sedî sed zimanê kurdî di pileya pêşî de ye. Lê sed mixabin guhdana partiyên me ta roja îro bi zimanê kurdî gelekî qels û lawaz e.. Lê tevî vê yekê jî li ber xwe dane û gelek kovar û rojname weşandine..
Ez jî wek nivîskar û hezkerekî zimanê kurdî, ku piraniya nivîsandinên min bi zimanê kurdî ne û ez pak serwextî çîroka geşbûna hin zimanên rojhilata navîn im, bêguman zimanê kurdî jî zimanek ji zimanên rojhilata navîn e.. Belê min di dîroka miletan de, di dîroka şerê zimanan de, wek ku şerê zimanê kurdî bi tundî hatiye kirin, şerê ti zimanî ne dîtiye û nehatiye kirin..! Bi taybetî di Kurdistana bakur de. Ji ber ku kesayetiya me di zimanê me de ye û em bi zimanê xwe kurd mane, neyarên me jî, ji mêj ve, ev yek naskirine û bi rêk û pêk şerê zimanê me kirine û dikin..
Roja îro çendî em li zimanê xwe xwedî derkevin, biparêzin û pêşve bibin, kovar û rojnameyan pê biweşînin wiha em hebûna xwe ya kurdî diparêzin. Ji sala 1923an ve, dagirkeran bi sedema ku zimanê kurdî nemîne, bi pilan şerê zimanê me kirine. Zimanê me wek sembola paşverûtî û nezaniyê destnîşan kirine û dikin. Û ne tenê planên bişaftina çand û ziman li ser me kurdan meşandine, lê belê wan xwestiye ku kurdan di her warî de paşketî û asîmîle bikin.
Mêzekin, bê çendî zimanê van netewan li cem wan şêrîn û biha ye; Hikumeta Fransî her sal ji bo geşbûna zimanê xwe konferansan li dor Frankfoniyê li dar dixîne.. Ji çend salan ve Tehran gotinên biyanî ji zimanê farisî dineqîne.. Dewletên erebî navên alavên ragihandinê û navê alavên pêdiviya rojane yên ku nû derdikevin û di cihanê tevî de bi yek navî naskirî ne wek Radyo, TV.. navên erebî li wan dikin.. Amerîka latînî devji zimanê espanî bernade û bi zimanê ingilîzî jiyana xwe derbas nake û wek ku em tev dizanin roja îro zimanê Şikispîr di dinyayê de zimanê yekemîn e ku zimanê bazirganiyê, toreyê û danûstandinê ye..
Eger em bi zimanê dagirkeran siyaseta xwe, rewşenbîriya xwe û danûstandina xwe ya rojane pêk bînin û rojnamegeriya xwe bi zimanê wan binivîsînin, dêmek kêşeya me wek gelê kurd li Rojava nîne û tev serhildan, raperîn û bizavên gelê kurd di ber azadî û serxwebûnê de şaşî û nezanî bûn..!! Erê, eger ziman ne di pileya pêşîn de be, bela her perçeyekî Kurdistanê bi zimanê dagirkeran biaxife û wiha kêşeya gelê kurd çareser dibe û namîne..! Hingî ti pêdiviya me bi Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Nalî, Bedirxaniyan, Hacî Qadirê Koyî, Cegerxwîn, Mokiryanî û Goran namîne, û di encam de taybetiya me wek gelê Kurd namîne.
Ma em bi destê xwe Mem û Zîn, Ferhad û Şêrîn, Siyamend û Xecê bingor bikin, zargotina xwe ya ku temenê wê bi hezarê sala ye bişewitînin..?!! Rast e roja îro du şêwezarên kurdî yên sereke di seranserî Kurdistanê de bikar tên (Kurmancî û Soranî), her wiha du alfabe jî berdestin (Erebî û Latînî), Kurmancîaxêf bi tîpên latînî û Soranîaxêf bi tîpên erebî dinivîsin. Herdu şêwezar jî ji zimanê kurdî re bûne standard.. Ez geşbîn im ku di pêşerojê de wê zimanê kurdî bi alfabeya latînî li seranserî Kurdistanê belav bibe, ji ber ku gava pêşîn ji standardkirina zimanê kurdî re yekîtiya tîpan e.
Di sala 1932an de, dema ku mîr Celadet Bedirxan kovara xwe (Hawar), li Şamê bi tîpên latînî weşand û naveroka wê bi berhemên nivîskarên kurmancan û soranan xemiland, hingê wî bîra vê yekê birbû û ne divîbû ku di pêşerojan de du alfabeyên standard ji zimanê kurdî re bêne bikaranîn. Dema dibêje: “Yekîtiya miletê kurd bi yekîtiya zimanê Kurdî tête pê. Di yekîtiya zimên de gava pêşîn jî yekîtiya herfan e. Yanî ji bona nivîsandina zimanê miletekî divêt zana û xwendewarên wî miletî, bi tevayî ji bona zimanê xwe elfabêyekê bibijêrin û heke di wî zimanî de çend zar hene, zar hemî bi wê elfabayê bêne nivîsandin”. Mîr Celadet BEDIRXAN Hawar, hejmara 10 / 1932an.
Bi vê helwestê ez jî bi gerimbûn dengê xwe tevî dengê van herdu rêber û nemirên gelê Kurd Mîr Celadet Bedirxan û Dr. Nûreddîn Zaza dikim.. Derbarê rojnamegeriya kurdî li nav kurdên Rojava; wek ku em tev dizanin ziman şertê herî serekeye ji rojnamegeriyê re.. Û em kurdên Rojava jî bi xêra Bedirxaniyan, xwedî dîrokek rojnamegerî ne. Berdewamiya me li kovara Hawarê vedigere û tevî ku zimanê me qedexe ye, me bi zimanê xwe û bi awayekî dizî û veşartî gelek kovar û rojname bi alfabeya kurdî latînî derxistine û hêjî hin ji wan têne weşandin.. Herwiha gelek kovarên bi zimanê erebî jî, ji rex partiyên me ve têne weşandin.. Lê sed mixabin, ji ber rewşa cudabûna partiyên me yên siyasî û cihêbûna wan ji hev, hin kovar û rojname bi eynî nav du car û sê car derketine..
Wek mînak dema ku partiyek siyasî ji maka xwe cûda dibe, herdu alî bi eynî navî kovarê derdixînin, wek Gelawêj, Stêr, Roj, Deng, Dengê Kurd.. Vêca di wiha xepartin de mirov rastî gelek dijwariyan dibe ta ku karibe her kovarekê li partiya wê bi nav bike.. Ji ber ku partiyên me di ser 18 caran re ji hev veqetiyan e.. Di baweriya min de rojnamegeriya me kurdên Rojava di çar qûnaxan re derbasbûye; bêguman qûnaxa Bedirxaniyan a herî giring û yekemîn e.. Qûnaxa duwemîn ewa ku ji salên 1960î ve destpêkiriye. Di pey van herdu qûnaxan re qûnaxa salên 1980î tête meydanê.. Lê qûnaxa giring a rojnamegeriyê di nav me de, ewa ku ji sala 1990î û virde destpêkiriye û wiha ta roja îro..
Derbarê wan kovar û rojnameyên ku di salên 1950î de li Qamişlo bi zimanê erebî hatine çap û belavkirin wek: (Xabûr 1951), (Sewt Elcizîre 1954), Elmewakib 1956), (Elşerq Elerebî 1957), û belavoka (Elberaaim 1960), mirov nikare wan ji rojnamegeriya kurdî bibîne, ne bi ziman û ne bi naverokê.. Kesên ku ev kovar û rojname weşandine ji rewşenbîrên parêzgehên din bûn, yên ku hatibûn li Qamişlo û akincî bibûn.. Wan û çend rewşenbîrên siryanî ji Qamişlo, ew kovar û rojname weşandine.. Angu tiştekî me kurdan di wan de nîne.. Eger kêmanî jî di vê geşt û xepartina min de hebin, min bibexşîn in.. Wek ku hûn tev dizanin tiştekî tekûz nîne.. Kurdan jî gotiye; Goşt bê hestî nîne.

Zinara Erebî li Rojavayê Kurdistanê

Roja 24ê Hezîranê ji her salê bîranîna “Zinara Erebî” ye, ku li herêmên kurdî, li Rojavayê Kurdistanê cîbicî bû. Piştî ku desthilata Sûriyê sala 1963 kete destê Partiya Baisê de, rejîmê biryara erebkirina herêmên kurdî da. Vê erebkirinê ne tenê şûn, war, gund û bajar li xwe girt, lê belê nav, ziman, xwendin, huner û stranên kurdî, ligel hemû aliyên jiyana civakî, aborî, perwerdeyî, hizrî û rewşenbîrî jî li xwe girt. Wateya (Erbekirin) yan (Taarîbkirinê) derbarê kurdan, ew e ku navên mirov, dukan,

şûn, war, gund, bajar û herêman bibine erebî. Herdu projeyên bi bandor di vî warî de, “Amara Awarte” ya 05.10.1962 ku rojekê tenê dirêj kir, herwiha Zinara Erebî bû, ku bi navê (El-Hizam El-Erebî) hate naskirin. Zinara Erebî projeyeke rejîma Bais a sûrî bû, lê di sala 1965 de, kete kar. Armanc ji Zinara Erebî ew bû ku navçeyên kurdî li Cezîra Sûriyê, ango li parêzgeha Hesekê ku bi berê 23000 km duca ye, ji kurdên nişteciî yên xwediyên wan deveran, vala bibin, bi mebesta bicihkirina malbatên ereban, li şûna wan kurdan. Ev proje bi dirêjiya 350 km û kûrahiya 20 kîlometreyan e. Ji sînorê Herêma Kurdistanê heta Serê Kaniyê ye. Desthilata Sûriyê dest danî ser zeviyên kurdan, bi mebesta ku Erebên navçeyên derdora Reqa û Helebê, biguhêze bo navçeyên kurdî, bi behaneya ku zeviyên wan bi sedema dirustkirina Bendava Feratê ketin bin avê. Êdî ew Erebên hawirdekirî, bi navê (Mexmûrî) yan jî (Xemer) hatin naskirin. Dewleta Bais zevî, dibistan, kar, pileyên hikûmî, pêdawîstiyên jiyanê ligel parastina asayişî û leşkerî ji wan ereban re peyda kir. Herwiha baştirîn û berhemtirîn zeviyên çandiniyê bi zorê ji cotkarên kurd stand û radestî wan Mexmûriyan kir û rejîmê ew zevî li ser navên wan jî tapo kir, bi awayekî ku ti mafê yasayî di destê cotkarên kurd de nebe ji bo vegerandina van zeviyan. Bêhtir ji 4500 malbatên ereb anîn ser axa kurdan. Ew li ser hêla sînorî ya di navbera Serxetê û Binxetê de, wate di navbera Bakur û Rojavayê Kurtdistanê de, bi destê hikûmeta Bais bicih bûn, ku nêzîkî yek milyon donim ji zeviyên kurdî, dan wan, bi wateya ku her malbatekê bi berê 150-300 donim zevî wergirt.

Têkbirina nasnameya kurdî

Bi mebesta têkbirina nasnameya kurdî û pijavtina kurdan bi siyaseta asîmîlasyonê, karekî xurt dihate kirin. Destpêka vê projeyê jî vedigere lêkolînekê ku efserekî Şaxa Siyasî ya Asayişa Rejîma Baisê, bi navê Mihemed Teleb Hilal ku sala 1962 amade kir. Eşkere di vê lêkolînê de hatibû ku pêwîst e Siyaseta Erebkirinê li hermên kurdî têkeve kar, bi koçkirin, birçîkirin, bêkarkirin û avakirina mêtingehên ku kurdan ji deverên wan bê cih û beş bihêlin. Hejmara mêtingehên erebî gihişte 42 mêtingehan. Li beramber vê yekê jî têkoşîn û berxwedanek hebû, lê belê hêza kurdan kêm û lawaz bû. Lê piştî şerê 6ê Çiryaya Pêşîn 1973 bi awayekî eşkere û berfireh, projeya Zinara Erebî û anîna Ereban bo navçeyên kurdî hate cîbicîkirin. Êdî 24ê Hezîrana 1974 biryara hejmar 521 derket, ku zevî ji 150 hezar nişteciyên 385 gunadên kurdî, ji tevaya 497 gundên kurdî, standin, ku bi dehên hezaran welatiyên Ereb anîn herêmên kurdî.

Amara Awarte

Berî projeya Zinara Erebî jî, 05.10.1962 Amara Awarte pêk hat. Vê amarê rojekê tenê dirêj kir. Regeznameya sûrî ji 120 hezar kurdan (Bi rêjeya % 15-20) hate kişandin, ango vê amarê, di wê serdemê de, tenê 100 hezar Kurd li xwe girt. Lê bi giştî hejmara kesên bê regezname heta sala 2011 gihişte nêzîkî 450 hezar kesên kurd. Lê ji encama Şoreşa Sûriyê 15ê Adara 2011 rejîma Sûriyê li gorî fermana serokatiyê ya hejmar 49 a 08ê Nîsana 2011 regezname da beşekî mezin ji wan kurdan, bi mebesta ku Kurdan ji vê şoreşê dûr bixîne û bi wateya ku tenê mafê kurdan wergirtina regeznameya sûrî ye. Beşek ji wan kesên bê regezname bi biyanî hatin binavkirin, ku tenê belgeyên wan ên tomarê hebûn. Lê beşekî din, her ew belge jî nebû. Ev kesên bê regezname, paseport, nasname, hotêl û nexweşxaneyên fermî û tomarkirina mal û samanan bi navên wan, ji wan re qedexe bûn, tew gellek astengî û rêgirî li dibistan û zanîngehan ji wan re derdiketin.

Civaka sivîl û guhertinên demoqratîk

Civakên mirovahiyê di gelek qonaxên pêşketinê de derbasbûne , nemaze civakên ewropayî di sedsaliya 17 an de û piştre dema şoreşa pîşesaziyê , ku desthelata rijêman qelskir û heybeta Dêrê kêmkir.
Li hemberî van guhertinan civakê bêtir xwe pêşxist û gelek serfirazî bidestxist, ta salên heştêyan di sedsaliya 20an de ku gelek rêjîmên yeklayen hatin helweşandin nemaz li Rojhelata Ewrupayê û li hindek welatên Cîhana Sêyem, ku çanda demoqrat, mafên mirovan û azadiyên bingehîn hatine gerandin li dijî diktatoriyetê, zulm û zorê.
Gelek astengî û dozên niştimanî û netewî çareseriya wan di rêça demoqrasiyeke durust re çareser dibin .
Cudabûneke stratîjîk û girîng heye di navbera Civaka sivîl û demoqrasiyê de , lê ya herî girîng Civaka sivîl e ku roleke wê bihêz heye di danîna bingehên jiyaneke demoqratîk hevbeş bi rûmet, aştî û wekhevîyê de.
Ji ber pêşketina pevçûnên navbera desethelat û gelan de sê têgeh hatine naskirin (civak, civaka siyasî û civaka sivîl), civak weke hemû hemwelatiyên normal ku di navbera wan têkiliyên civakî û abûrî çêdibin û Civaka siyasî weke dewlet bi hemû rêxistinên xwe, partî û rêxistinên siyasî ku armancên wan desthelatdarî ye yan ber bi wê ve diçin, lê Civaka sivîl di navbera herdû aliyan de ye û hemû xwestek û daxwazên civakê dighîne kesên di cihê biryarê de ne, di dewletê de bi taybet û di Civaka siyasî de bi giştî.
Ev civaka sivîl bi hemû rêxistinên xwe kar dike di hemû warên siyasî, abûrî, komelayetî, perwerdehî, rewşenbîrî, ramangerî, tendurûstî , xêrxwazî , xizmeta rojane û ji bilî van jî, armancên wê yên herî berz bilindkirina nirxê mirovan û bergiriyê di ber maf û berjewendiyên hevwelatiyan xwebexşin, serbixwe bi giştî û kesên neçar bi tybetî dike.
Hemû rêkxistinên Civaka sivîl ne, xebat û çalakiyên wan aştiyane ne dûrî tûndûtûjiyê ne, û ti girêdana wan bi dewletê yan bi partiyên siyasî re tune ne û ti armancên wan tune di desthelatdariyê de. lê nerîna wan a pêşerojê û stratîjîk heye ji aliyê sîstema rijêmê ve.
Kesên desthelatdar dixwazin rêxistinên Civaka sivîl bikin desteke ji hukumdariya xwere di rêya aydiolojîk û rewşenbîriyê re, lê ji aliyê çalakvanên Civaka sivîl ve , ew Civak qada pevçûn û danûstandê ye ji bo mafên gel.
Di Rojhelata Navîn û Cîhana sêyemîn de du rengên Civaka sivîl hene, ê yekemîn di navbera xwendevan û rewşenbîran de ye, an ku qada xebata wan tenge û bê hêze û awaye tê hezkirin ji aliyê desthelatdariyê ve.
Û ya duyemîn rengê civaka sivîl a gelêrî ye ku metirsiya desthelatdariyê jê heye, ji ber ku ew xebat dike ji bo guhertinên demokratik di welat de.
Ji ber vê yekê Civaka sivîl li ser sê eniyan xebat dike: A yekemîn eniya xebata ji bo parêziya serxwebûna welat de li dijî dujminan. A duyemîn eniya demokratik, azadî û rûmetê li hundirê welat ku xebata li dijî sitem û diktatoriyeta rijêmê ye û a sêyemîn enya hevwelatbûnê ye ku xebata li dijî endambûna siyasî li gorî nasnameya mezhebî, êlî, olî û pêkhatîye (taîfî).li dijî perçbûna Civaka sivîl û dewletê ye.Lê civaka sivîl bê siyaset û ji derveyî xebata demoqratik karekî beravêtî ye û neçar e.
Feylesûfê Ferensî Can Cak Roso dibêje „ mirov başe ji koka xwe de, lê Civak wî xerab dike, ji ber vê yekê gereke civak bê çaksazkirin û perwerde ya demoqrasiyê hîn bibe”. Yek ji karên serekî yê Civaka sivîl ewe ku çanda demoqratîk û buhayên wê di nav gel de biçîne, ne weke nuha ku bêtir çanda nasnameyên siyasî tê çandin û weşandin di nav gel de?
Ji bo keleha demoqrasiyê durust û rasteqîne
bi hêz bike, ku karibe derfetên guhertinên dîrokî bi dest bixe û serkeftinê pêk bîne.
Weke tê xuyanîkirin civaka sivîl li ser du tiştên girîng tê avakirin, xêra giştî ya gel û demoqrasiya zindî, ji bo pejirandina yekîtîyek civakî siyasî ku erkên xwe yên niştimanî û netewî pêk bîne.
Demoqrasî weke gulekê ye nayê çandin ne di bexçeyê Civaka sivîl a pêşketî de be.
Weke nuha çê dibe li gelek welatên Rojhelata Navîn mîna Misrê, Lîbiya, Yemen û Sûriye, ku daxwazên milletên wan _ di nav de milletê kurd li Rojavayê Kurdistanê _ azadî, rûmet û demoqrasî bû, lê mixabin ew şoreşane ne gihiştine armancên xwe ta nuha, ji ber çi haziriyek durust ne hatibû kirin ji van bûyerên girîng re, û a herî stratîjik nehebûna civakên sivîl fereh, serbixwe û azad, yan qelsbûna wê bû.
Ji ber di dîroka gelan de weke nimûne têne gotin , çawa raperîna gelê Poloniyayê li dijî rêjîma komonîst yeklaye hate serkeftin , nemaze bi çalakiyên sendîkaya karkeran „Tedamun „ ku perçak ji Civaka sivîl bû di dawiya heştêyî de di sedsaliya 20 an de.
Û li welatê Îndonîsiyayê jî çawa Civaka sivîl xurtbûneke bi hêz da guhertina demoqratîk .
Nimûneyeke din welatên Iraqê, erê Seddam Huseyn çû lê sîstem nehate guhertin , lewra Nûrî Malikî bû Seddamê duyemîn.
Civaka sivîl cudaye ji dewletê û ne peyê wêye, lê bi erkên xwe erkên dewletê rastdike û ji aliyekî din ve kêmasiyan temam dike. Civak bê dewlet nabe Civaka sivîl, lê wê

T.C.K
Tevgera Ciwanên Kurd
حركة الشباب الكورد

DENGÊ CIWANÊN KURD

Ciwan

Siyasî - Rewşenbîrî - Civakî | Nîvmehî | Nîvê Tîrmehê 2015

Kurdên Bakur fitre û zekata îsal didin Rojava

Li bajarê Amedê yê Bakurê Kurdistanê Komeleye ê alî ji bo alîkariya xelkê Rojavayê Kurdistanê dest bi kampanyayekê kirin.
Birêveberên kampanyayê dixwazin îsal herkes fitre û zekatên xwe bidin xelkê Kobanî û Rojavayê Kurdistanê.
Muftîtiyê Amedê Burhan Îşleyen daxwaz kir ku her kes fitre û zekatên xwe bide kesên muhtaç û destnîşan kir ji ber vê yekê jî dayîna fitreyan bo penaberan xêreke mezintir e.
Muftiyê Amedê derbarê dayîna fitre û zekatan de ragihand: "Divê em fitre û zekatên xwe bidin
penaberên ku ji
welatên cînar hatine. Ew ji her kesî zêdetir muhtac in."

Li Hesekê şer berdewam e

Şer û pevçûnên navbera çekdarên DAIŞê û hêzên Hikûmeta Sûriyê li bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê berdewam dike û di êrişeke DAIŞê de baregeha Parêzgeha Hesekê agir pê ket.
Li gor agahiyên ku medyaya fermî ya Hikûmeta Sûriyê belav kirine, agirekî mezin bi avahiya parêzgeha Hesekê li rojhilatê bajar ket.
Li gor nûçeya medyaya fermî ya Sûriyeyê, çekdarên DAIŞê di berdewamiya şerê ligel hêzên hikûmeta Sûriyê de, gulleyekê RPC avêtine baregehê parêzgehê û di encam de agirek mezin bi vê avahiyê ket.
Heya niha jî şer û pevçûnên dijwar li taxa Neşwe ya rojhilat û taxa Xwêran li rojevê Hesekê ye di navbera artêşa Sûriyê û çekdarên DAIŞê li bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê berdewam dikin.
Ji aliyekê din ve çekdarên DAIŞê êrişî ser taxa kurdî ya Ezîziye li vî bajarî dikin û hewl didin vê taxa kurdî jî kontrol bikin. Taxa Ezîziye di bin kontrola şervanên YPGê de ye,
lê xortên hin kolanên wê taxê ku ereb lê dijîn, tevlî çekdarên DAIŞê bûne û ew kolan ketine destê DAIŞê.

Bûyerên vê heyvê ;

Şehîdkirina D.E.Qasimlo

Di 13\7\1989 Şehîdbûna Duktor Ebdirrehman Qasimlo Sekretêrê PDK-Îran li Viyênayê bi destê sîxurên rêjîma Tehranê di dema civînekê bi nûnerên Îranê re bo çareserkirina kêşeya kurd .
D.Qasimlo ji zayîna bajarê Urmiyê yê Rojhelata Kurdistanê 1930 e , xwednina xwe li Îran û Îraq û Istanbûlê bi dawî kir û bi alîkariya Helbestvanê kurd ê navdar Mûsa Enter û xwendevanê kurd gihişt Parîsê û li Fransa û Çîkoslovakya berê xwedina xwe ya bilind bi kuta kir û deplema profesoriyê ji zanîngeha Pragê wer girt.
Di sala 1973 de hate helbijardin Sekreterê PDK-Î ,û gelek caran daket Rojhelat û bi taybet di sala 1978an de bi nêzîkî 20 hezar pêşmerge karî bûn çend bajar û bajarokên kurdistanê rizgar bikin .
Piştî ketina Rijêma Şah şer derket di navbera kurdan û desthelatdarên nû yên wî welatî , Rijêma Xumeynî dijî mafên
kurdan derket û karî bû bi çekên giran derbasî bajarên kurdistanê yên rigar kirî bibe di 1983an de,
lê şoreşa kurdî berdewam ma û çalakiyên pêşmergeyan ne rawestiyan.

Peymana Lozanê û binpêkirina mafên

-Di 24ê Tîrmeha 1923ê ji bo çaresera arîşeya Anadol û parçekirina Emperatoriya Osmanî di navbera Hevalbendên Şerê Cîhanî yê Yekê û Civata Neteweyî ya Mezin ya Tirkiyê li bajarê Lozanê hat morkirin.
Vê peymanê Peymana Sêvrê ku di navbera hevalbendan û Emperatoriya Osmanî da hatbû morkirin betalkir.
Peymana Lozanê verêja xebata Tirkan bi seroktiya Ataturk û berjewendiyên nû yên welatên mîna Brîtanyayê li herêmê bû .
Peymana Sîverê ku di tebaxa 1920an de hatibû mohrkirin , ji bo daxwazên gelê Kurd û çareseriya kêşeya kurd ya herî dîrokî bû , taybet hersî bend 62,63,64 ji bo Kurdan hatibûn danîn .

PDKÎ salvegera şehîdbûna Qasmilo bi çalkiyan bibîr anî

Partiya Demokrat a Kurdistanê-Îran (PDKÎ) bi boneya 26 emîn salvegera Şehîdbûna rêberê wê partiyê yê berê D. Ebdulrehman Qasmilo çalakiyên corecor li Rojhilatê Kurdistanê li darxistiye.
13ê Temûzê PDKÎ li bajarên (Seqiz, Merîwan, Ormiyê û Bokan) li Rojhilatê Kurdistanê çalakiyên corecor bi boneya 26 emî salvegera roja şehîdkirina D. Ebulrehman Qasmilo li darxistin û di van çalakiyan de siloganên corecor hatin bilind kirin û soza wefadariyê bo mîrasê Qasmilo hate nûkirin.
Li taxên bajarê Seqiz dîmenên Qasmilo û posterên corecor hatin belavkirin, herwiha alîgirên wê partiyê li çend navçe û gundên ser bi bajarê Merîwan ve çalakî sazkirin bi taybet li ser kolana serekî ya di navbera Merîwan û Sine de û li gundên (Goşxanî, Bêsaran, Rezaw, Kerawa û Dirêle ser bi navçeya Kelaterzan.) li şaredariya Sewlawa bi sedan dîmen û posterên Qasmilo gihandin malên welatiyên Kurd, herwiha eynî çalakî li heryek li bajarên Merîwan, Bokan û Ormiyê hatin li darxistin.
Ebdulrehamn Qasmilo di roja 13.07.1989 li paytexta Nimsa li Viyêna di dema ku gotûbêj li gel Hikûmeta Komara Islamiya Îranê dikirin li ser masa gotûbêjan hate têrorkirin û di encamp de şehîd ket.

الكورد وشرك داعش

د. فريد سعدون



لم يستطع الكورد ضبط الإحداثيات البيانية لخططهم الاستراتيجية المدججة بانزياحات تنكث لحمتها كلما أرادوا لها الاتقان، وحاولوا مرارا التغلب على شرك المتاهات التي يحشرون أو يساقون في سراديبها، فيمتحنون في أهلية ملكاتهم العقلية والسيكولوجية ودهائهم في فك الألغاز المخادعة، وقدرتهم على المناورة في التملص من فخاخ المكيدة، وبذلك انشغلوا بتشريح المعادلات السياسية التي تعنى بتدبير شؤونهم من خلف الأبواب الموصدة، ولأنهم أبعد من الوصول إلى عتبات المسالك التي تفضي إلى تلك الأبواب، فقد آثروا استراق السمع والامتثال للهواتف وعزيف الأوامر النائية، ظنا منهم أنها همس الضمير ونداء الواجب القومي، فتوهموا أنما يستمدون عزمهم وقرارهم من ذات أنفسهم، بينما كان الآخر الغربي أو الإقليمي يرسم المسارات بعصاه التي تتبع القوى الكردية مدارات حركتها وإشاراتها، وأنى لمن لا يملك قرار نفسه أن يحدد مصيره ؟ إنه المصير المنهوب بالشعارات الجوفاء، والمصطلحات اليتيمة، والأحزاب الثكلى بالانشقاقات، بينما يشرئب الوطن في توقه إلى الخلاص بأعناق تتلقفها السيوف المجردة على النحور، حتى كأنها تهفو إلى كسر أغلالها، وتنشد القيامة على صليب الجلجلة، بيد أن القرار يستدرجها إلى سرير الويلات والثبور، فمن أين لهذا المصير الشقي أن يعلن انبثاقه من رماد القهر والإرغام والاستلاب ؟ ومن أين لهذا الشعب الكردي ستأتي الأخبار بما لم يزود، وقد علق الجناح في شرك مكين، فبات يعالجه وهيهات له النجاة ؟ مضت عقود حمل فيها الكردي بندقيته وهويصارع من أجل البقاء، وكان العدو جليا بينا، يعرفه القاصي والداني، وكان يظن الكردي أن حقه هناك في تلك العواصم : بغداد ودمشق وانقرة وطهران .. وفجأة جنحت البوصلة فاختلت الاتجاهات، وتاهت الحراب والبنادق عن الهدف، فبات عدو الأمس حليف اليوم، رغم أنه لم يعترف للكردي بحقه، ولم يكتف الكردي بالقتال معه في خندق واحد، بل قاتل الكردي عنه وعن نفسه في الخندق وحده، ماذا لو انتصر الكردي على داعش، وحرر سوريا والعراق منهم ؟ هل سيعلن دولته، أم سيقدم هذا التحرير للحكومات المركزية التي تنكر عليه حقه ؟ وهل حقا داعش ترى في غزو بلاد الكورد هدفا استراتيجيا لبناء امبراطوريتها الإسلامية ؟ ههنا بالضبط ينكشف اللثام عما يظل خافيا في تلافيف الاستفسارات المخاتلة، ثمة تورية تحجب إجابة في منتهى الخطورة ! انبثقت داعش من الفكر المكنون في متون الصحائف الأزلية التي دونت الأحلام الأبهية عن الفردوس المفقود، ولكنها ارتوت من عنجهية القوى الغربية في بسط الفوضى الخلاقة – فقط – في شرقنا المسحور، واكتنزت من فائض دولارات النفط الخليجي، وترعرعت في مدارس السلفية التي اعتقدت بعض الأنظمة الملكية العربية أنها حرزها الحصين، فاستملكت واستأثرت وتمددت، بعد أن عقدت آلاف الرايات السود لها الولاء على أن تحارب الظلم والكفر حتى يأتيها الفتح المبين، أو شهادة اليقين، واحتضنتها ولايات العرب من أهل الرقة والموصل، ولم يجد الغرب، ومعهم الأنظمة المتهالكة غير الكورد في دحرهم، فإن كانت الغلبة للكورد، فقد أمنت الأنظمة من شر داعش، ولم تخسر شيئا، وإن فتكت بهم داعش، تكون قد تخلصت من مطالب الكورد وكسرت شوكتهم، و وأدت دولتهم المأمولة. فأي مكر هو الذي ساق الكورد إلى شرك داعش ؟ ثمة وراء الإصرار على الاشتباك مع داعش خطورة تكمن في التحول المفاجئ من النضال القومي إلى التوحل في المستنقع الطائفي، والحال الراهنة تخفي الخديعة المتربصة بالكورد، رويدا رويدا ستكون ثارات الحسين في عقر دار الكورد، وستدك الثارات الطائفية أسوار الحصن القومي الكردي، وهذا ما سيفتح الذاكرة على عمقها التاريخي الديني والميتافيزيقي، ومن هنا تستمد المعركة المفروضة خطرها باعتبارها حدثا يستبطن تحولات نوعية في النضال الكردي، سيكون لها – لاحقا – تداعيات جوهرية تمس الوجود نفسه. ولكن في ظل الإغواءات التي استدرجت الكورد إلى حقل مدجج بالمفاجآت، هل كان هناك ممر آمن لتجنب الويلات؟ ذاك الممر أحجية معقدة لم يهتد الكورد إلى فك طلاسمها، ولم تترك لهم داعش فرصة للتأمل والتحليل، وجاءت الإغراءات الغربية، وتسهيلات الأنظمة، لتزيد من شهية الكورد في الاقتراب من تدشين حدودهم المأمولة، بيد أنهم تغافلوا عن التاريخ والجغرافيا والتجارب السابقة، وما تقدم جحافل الكورد إلى تخوم الموصل والرقة إلا استدراجا إلى العمق الصحراوي المفعم بالتيه والضلال والمهالك، ما لهم وللصحراء؟ فللصحراء أعرابها، وهذا الاصطدام سيكون تغيرا دراماتيكيا أليما، لأنه يهدد قواعد المعركة، إذ حافظ الكورد على أخلاقيات الحرب طويلا، ولم يخوضوا غزوات جاهلية تفتك بالأمة العربية، بل كانت حربهم ضد ثلة من الظلمة والمجرمين وفراعنة العصر، وأي تحول في هذا الصراع سيكون فاجعة لن تكفكف مدامعها لقرون، فالحذر من الدخول في صراع كردي عربي عبر بوابة داعش أمر في غاية الأهمية. إذ الهدف الكردي الجوهري حقهم المسلوب، ولكن داعش باستراتيجيتها العابرة للقوميات لم تترك لهم مناصا غير الذود عن حياضهم المهددة بالامحاء ومتابعة القتال على جبهات جديدة لم تكن بالحسبان، مما يعني كتابة التاريخ الكردي بأسلوب جديد لا مفر فيه عن الخوض في بحار الدماء

موجبات فزع تركيا ودوافع تهديداتها باجتياح شمالي سوريا

كوهدرز تمر

